Serokwezîrê Herêma Kurdistanê di çarçoveya beşdarbûna di Lûtkeya Cîhanî ya Keşûhewayê de, bi Sekreterê Giştî yê



Neteweyên Yekgirtî re civiya.

Di çarçoveya Lûtkeya Keşûhewayê ya Cîhanî ya li Dubayê de, Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwazî li Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî Antonio Guterres kir.

Di hevdîtinê de pêşhatên dawî yê reşsa Iraqê û şer û aloziyên li Rojhilata Navîn hatin gotûbêjkirin.

Ji aliyê xwe ve, Serokwezîr Mesrûr Barzanî tekezî li ser girîngiya rola UNAMI û berde-wamiya erkê xwe ji bo aramî, aştî û asayîşa Iraqê kir.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî behsa pêwîstiya çareserkirina pirsgirêkên di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal û dabînkirina mafên destûrî yê gelê Kurdistanê kir û bang li Neteweyên Yekgirtî kir ku di çareserkirina pirsgirêkan de rola aktîf bilîze.

Pêşewa Hewramanî ji Emmar Hekîm re: Hikûmeta Federal mûçeyên mamostayên Kurdistanê ragirtiye

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi daxuyaniyekê bersiva daxuyaniya Serokê Tevgera Hikme ya Niştîmanî da û got, "Hikûmeta Iraqê bi awayekî nedadperwerane mûçe û bûd-ceya Herêma Kurdistanê naşîne."



Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Hêmin Hewramanî şeva borî di daxuyaniyekê de ragihand, "Serokê Tevgera Hikme ya Niştîmanî peyamek arasteyî Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir û tê de daxwaz ji hikûmeta Herêma Kurdistanê dike ku mûçeyê mamostayan bide."

Hewramanî dibêje: "Em bi temamî ligel vê peyamê ne, lê haya wî jê heye ku ne Hikûmeta Herêma Kurdistanê mûçeyan nade, belkû Hikûmeta Federal mûçeyên mamostayan û mûçeyên hemû karmendên Kurdistanê ragirtiye û bi awayekî nedadperwerane mûçe û bûdceya Herêma Kurdistanê naşîne."

Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê dibêje: "Em bang li birêz Seyid Hekîm dikin ku berê xwe bide Bexdayê û piştgiriya bide bidawînanîna li vê nedadperweriyê."

Hewramanî tekez dike jî: "Hikûmeta Herêma Kurdistanê hemû erkên xwe cîbicî kiriye û pabendî rêkeftinan bûye, lê me ev yek ji aliyê din ve nedîtiye." Herwiha da zanîn jî: "Heta dema ku dahat di destê Hikûmeta Herêma Kurdistanê de bû, mûçeyên hemû karmendan dida, lê piştî hişkkirina çavkaniyên dahatê yê Herêma ji aliyê Bexdayê ve, pirsgirêk ji bo mûçeyên karmendan çêbûne." Berdevkê Hikûmeta Herêma Kurdistanê dibêje: "Birêz Hekîm wek çawa ber rola xwe ya çak lîstiyê, hêvîdar in di vê pîrsê de jî bang li hemû aliyên Iraqî bike ku çavên xwe li vê zilma ku li karmendên Hikûmeta Herêma Kurdistanê tê kirin, negirin."

Nêçîrvan Barzanî li Dubaiyê bi serkirdeyên cîhanê re civiya

Serokê Herêma Kurdistanê di çarçoveya Lûtkeya Avhewayê ya Cîhanî ya li Dubaiyê de bi serok û serokwezîrên welatan re civiya.

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî li ser vexwendina fermî ya Serokê Îmarata Erebi Şêx Mihemed Bin Zayîd Al Nehyan li Dubaiyê beşdarî merasîma destpêkirina Lûtkeya Avhewayê ya Cîhanî (COP28) bû.

Bi beşdariya serok û serkirdeyên cîhanê 30ê Çiriya Paşînê civîna Lûtkeya Avhewayê ya Cîhanî (COP28) dest pê kir.

Di çarçoveya lûtkeyê de, Nêçîrvan Barzanî bi Şahê Bîrîtanîyê Charlesê Sêyem, Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres, Seroka Komîsyona Yekîtiya Ewropayê Ursula von der Leyen û bi dehan serok û rêve-



birên welatan re civiya.

Nêçîrvan Barzanî li ser hesabê xwe yê Xê daxuyanî da û got:

"Ji bo parastina gerestêrka me, pêwîstî bi hevahengiya cîhanî û xebata bi hev re heye."

Dê îro ku Roja Neteweyî ya Îmarata Erebiyê ye, li Expo Duaiyê lûtke bi rê ve biçe.

Dê Lûtkeya Avhewayê ya Cîhanî (COP28) heta 2yê Çiriya Paşînê berdewam bike.

CENTCOM ragehandinekê li ser êrîşa Kerkûkê parve dike

Fermandeya Navendî ya Artêşa Amerîkayê CENTCOM ragehandinek li ser êrîşa doh a Kerkûkê parve kiriye û piştast kiriye ku pênc çekdar kuştine.

Roja Duşemê, 4ê Berçileyay 2023ê, Fermandeya Navendî ya Artêşa Amerîkayê CENTCOM ragehand, li Kerkûkê hêzên hevpeymanan êrîş kir ser pênc çekdaran ku amadekarî ji bo êrîşeke dronî dikirin. CENTCOM amaje da wê yekê jî ku, hêzên hevpeymanan ji bo ku bergiriyê ji xwe bikin bi rêya dronan bersiva wê êrîşê daye û di wê êrîşê de her pênc çekdar hatine kuştin û ew dron jî hatiye pûçkirin. Her di wê ragehandinê de Fermandeya Navendî ya Artêşa Amerîkayê CENTCOM eşkere kiriye ku, pêşwext hêzên Îraqî li ser wê êrîşê haydar kirine. Tekez jî kir ku ew dê li ser parastina hêzên Amerîkayî û hevpeymanan ji êrîşan berdewam bin.

Doh roja Yekşemê, 3ê Berçileyay 2023ê, çavkaniyekê ji hêzên ewlehiyê yê Îraqê ji K24ê re



ragehand, "berî demê ke kêm li bajarkê Dûbizê ku dikeve başûrê rojavaya Kerkûkê balafireke nenas êrîşî Heşda Şebî kiriye".

Di eynî demê de Bereyê Bergiriyê yê Îraqî jî di ragehandinekê de amaje dabû, "Me îro roja Yekşemê, 3ê Berçileyay 2023ê, bingeheke serbazî ya Amerîkayê li bakurê rojhilata

Sûriyeyê kiriye armanc û me armanca xwe bi reneki rasterast hingaftiye".

Ji 17ê Cotmeha îsal were, 74 caran ji aliyê komên çekdar ve li Îraqê û Sûriyeyê êrîşî hêzên Amerîkayê hatiye kirin. Li gor Pentagonê, 62 serbazên Amerîkayî di wan êrîşan de birîndar bûne.

Parêzgarê Kerkûkê yê ferzkirî rê li ber karkirina nêzîkî 800 bijîşkên Kurd digire

Nêzîkî 800 derçûyên beşa Bijîşkî li Kerkûkê, li dijî astengkirina fermanên tayînkirina wan, li hev civiyan û nerazîbûnên xwe nîşan dan.

Peyamnêrê K24ê li Kerkûkê ragihand, li Bexdayê fermanek ji bo wergirtina bijîşkan hatiye dayîn, lê parêzgarê Kerkûkê yê ferzkirî, rê nêda ku ew bijîşk bêne tayînkirin.

Bijîşkê bi navê Mihemed ji K24ê re ragihand: "Roja 24ê Îlona 2023an fermana wezaretê ji bo tayînkirina me hat dayîn, lê parêzgarê Kerkûkê dibêje, nasnameya we a sala 1957ê ne li Kerkûkî ye. Di demê de ku kartên me yê niştîmanî, formên xwarinê û hemû tiştên me yê li ser Kerkûkê hene,



lê parêzgarê me yê ferzkirî dibêje: Hûn ne Kerkûkî ne."

Derçûyeke din a beşê bijîşkî li Kerkûkê dibêje: "Em nêzîkî 800

kes in, fermana karê me hatiye dayîn, lê parêzgarê ferzkirî nahêle em dest bi karên xwe bikin."

Li ser fermaya Mesrûr Barzanî nîrxê elektrîkê li deverên pişesazî û projeyên niştecîhan tê kêmkirin

Hikûmeta Herêma Kurdistanê nîrxê elektrîkê ji bo deverên pişesazî û projeyên niştecîhbûnê kêmkir.



Piştî ku giliyên hin welatî û kasibkaran bi rêya K24ê re, gihîştin aliyên pêwendîdar, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî biryara kêmkirina nîrxê elektrîkê li deverên pişesazî û projeyên niştecîhbûnê da.

Berdevkê Desteya Veberhênanê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Bergeşt Akareyî ragihand, piştî çavdêrkirina rewşa elektrîkê li deverên pişesazî û projeyên niştecîhbûnê, rêjeya kêmkirina elektrîkê dê %12 be.

Akareyî diyar kir jî, ev biryar ji sibe (29.11.2023an dikeve warê cibîckirinê.

Berî niha Wezaretê Elektrîkê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê daxuyaniyek belav kiribû û tê de gotibû, "Piştî civîna dawî ya Encûmena Şewirmendiyê, Wezaretê Elektrîkê li gorî desthilatê wê, dikare pêşniyara kêmkirina an zêdekirina bi berçavgirtina rewşa welatîyan, piştgiriya hikûmetê ji bo bihayên elektrîkê, kêmkir yan zêde bike."

Parlamentera Kurd soza xwe bi cih anî: Zimanê Kurdî dê li zanîngeheke Almanyayê bê xwendin

Parlamentera Partiya Yekîtiya Demokrat a Krîstiyana (CDU) Seyran Papoyê ragihand ku wê soza xwe ya berî hilbijartinan dabû bicîh anî.



Seyran Papo ji Rûdawê re diyar kir ku zimanê Kurdî dê li zanîngeheke Almanyayê bê xwendin. Seyran Papo ya bi eslê ji navçeya Cizîrê ya Şimexa Bakurê Kurdistanê, di hilbijartinên 8ê Gulana 2022yan de li herêma Schleswig-Holstein a Almanyayê ji Yekîtiya Demokratîk Xiristiyana a Almanyayê (CDU) wek parlamenter hat hilbijartin.

Di encama hewldana Parlamentera Kurd Seyran Papoyê de, li Zanîngeha Kielê ya Almanyayê kursa zimanê Kurdî roja îne dest pê kir. Seyran Papoyê ji Rûdawê re behsa projeyên xwe kir.

Papoyê diyar kir ku wan soza beriya hilbijartinên parlamentoya eyaleta Schleswig-Holsteinê dane dengdêrên xwe bi cih anî û got: "Ev projeya me ji bo herêma Schleswig-Holsteinê ye. Beriya hilbijartinan soza me hebû ku li dibistan an zanîngehan darsa Kurdî bê dayîn. Ev projeyek e ku bi pêşengiya min û partiya min CDUYê ye.

Me mehek berê hefteyekê ceribandinek kir ku em bizanin ka dê ders çawa derbas bibin. Em dikarin bibêjin gelekî baş derbas bû.

Mamosteyê kursê Îbrahîm Şêxo ye. Xwendekarên li eyaleta me dixwînin eleqeyêke mezin nîşanî dersên mamoste Îbrahîm Şêxo didin. 30 xwendekarên din jî serî li kursê dane." Seyran Papo 7ê Nîsana 1988an de wek zaroka malbateke ji navçeya Cizîrê ya Şimexê li Almanyayê ji dayik bû.

Piştî sala 2015an li dadgehên Bakurê Almanyayê wek wergêra sondxwarî dest bi kar kir.

Papo ku di nav CDUYê de dest bi jiyana xwe ya siyasî kir, bû endamê lîjnaya rêvebirîya herêma Kielê. Sala 2019an bû berpirsa entegrasyon û siyaseta penaberan a CDUYê. Ew di sala 2022yan de ji partiya xwe wekî parlamenter hat hilbijartin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî pêşwaziya Konsulê Giştî yê nû yê Fransayê dike

Îro roja Çarşemê, 29ê Mijdara 2023ê, Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî pêşwaziya Konsulê Giştî yê nû yê Fransayê li Herêma Kurdistanê Yan Brêm kir.

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê destpêkirina karî li Konsulê Giştî yê nû pîroz kir û daxwaza serkeftinê ji wî re kir û piştevaniya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo zêdetir pêşxistina peywendiyên dualî diyar kir.

Konsulê Giştî yê nû yê Fransayê jî amaje da ku Herêma Kurdistanê pêgeheke giring û taybet li nik Serokê Fransayê û xelkê Fransayê bi gîstî heye, herwesa dilxwaziya



welatê xwe jî ji bo berdehamiya peywendiyên bi Herêma Kurdistanê re di warên cuda cuda de tekez kir.

Danûstandinên li ser dawî pêşhat û guhertinên Îraq û deverê jî pareke din a wê hevdiştinê bû.

Doza Vartinisê ket ber demboriyê



Doza "Komkujîya Vartinisê" ku tê de 7 jê zarok 9 kes hatibûn ket ber demboriyê û hat hilweşandin.

Li gundê Vartînîsê yê girêdayî navçeya Beranîkê ya Mûşa Bakurê Kurdistanê 30 sal berî niha ji heman malbatê 9 kes hatibûn kuştin.

Runiştina 20mîn a doza wê komkujîyê îro li 1emîn Dadegeha Cezayên Giran a bajarê Kirikkaleyê yê Tirkiyeyê bi re ve çû.

Dadgehê bi hinceta ku di ser bûyerê re 30 sal û 2 meh derbas bûne, doz hilweşand û dosya bêyî kesek ceza werbigre hat girtin.

Li gundê Vartînîsê yê navçeya

Beranîka parêzgeha Mûşa Bakurê Kurdistanê 3ê Çiriya Pêşîna 1993yan leşkerên Tirkiyeyê agir berdan xaniyê malbateke Kurd.

Ji heman malbatê 7 jê zarok 9 kes canê xwe ji dest da.

Di komkujîyê de Mehmet Nasir Ogut, Eşref Oran Ogut, Sevda Ogut, Sevim Ogut, Mehmet Şakir Ogut, Mehmet Şirin Ogut, Aycan Ogut, Cihan Ogut û Cinal Ogut canê xwe ji dest da. Ji malbata Ogut bi tenê keçek sax maye ku ew jî wê şevê ne li malê bû.

Tometbarê serekî Bulent Karaoglu ku wê demê Fermandarê

Cendirmeyên wê deverê bû xanenişin e û sax e lê ev 30 sal in tu dadwer û dozger nikarin wî derxin pêşîya dadgehê.

Parêzerên Dosyeyê dan xuyakirin ku ew dê berdeham kar li ser vê dosyê bikin, dê serî li Dadgeha Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê û Dadgeha Mafên Mirovan Ewropayê bikin.

Tîma Parêzeran di konferansekê rojnamevaniyê de rexne li desthilata dadweriyê girt ku di vê dosyeyê de adilane kar nekiriye.

Tîma parêzeran diyar kir ku çend daxwaziyên wan li ser vê mijarê hebûn lê nehatine bicîhkirin û desthilatên dadweriyê tohmetbarê sereke negirt heta ku reviya.

Bi bultena sor li tometbarê sereke Fermandarê Hêzên Cendirmayan yê wê demê Bulent Karaoglu digerin û biryara girtina wî jî heye lê nayê girtin. Ew hîna jî mûçeyê xwe yê xanenişîniyê ji bankeyan werdigre û diyar e tê parastin.

Dozên ku 30 sal di ser wan re derbas dibin û tometbarên wan neyêne girtin ango bê encam bimînin, dikevin ber dema dirêj û tîne girtin.

Balafirên Tirkiyeyê careke din Gare, Metîna, Xakurk û Qendîl bombebaran kirin

Wezaretê Parastinê ya Tirkiyeyê ragihand ku balafirên Tirkiyeyê 16 armancên PKKyê yên li Gare, Metîna, Xakurk û Qendîlê bombebaran kirine.

Wezaretê Parastinê ya Tirkiyê derbarê bombebaranê de li ser hesabê xwe ya medayaya civakî daxuyaniyek belav kir.

Wezaretê ragihand ku balafirên wan ên şer demjimêr 18.30ê êvara doh navçeyên Gare, Metîna, Xakurk û Qendîlê yên di nav axa Herêma Kurdistanê de bombebaran kirine.

Li gorî Wezaretê Parastinê ya Tirkiyeyê di wan bombebaranên de 16 armancên PKKyê hatine jinavbirin ku ji şikeft, sitargeh û binkeyên PKKyê pêk tên.

Wezaretê Parastinê ya Tirkiyeyê di daxuyaniya xwe de îdia kiriye ku wan ew operasyona hewayî ya di nav axa Herêma Kurdistanê de li gorî madeya 51emîn a peymana Neteweyên Yekbûyî, "di çarçoveya



mafê rewşa yê xwe parastinê" de pêk anîne.

Hêzên Parastina Gel (HPG) ku baskê serbazî yê PKKyê ye di daxuyaniya xwe ya herî dawî ya 27ê Çiriya Paşîn de ragihandibû ku

gerîlayên wan di 48 demjimêrên borî de li Zap û Avaşînê 8 caran êrişî leşkerên Artêşa Tirkiyê kirine.

HPGyê da zanîn ku di wan êrişan de 2 leşker hatine kuştin û leşkerekî din jî birîndar bûye.

175 hezar karmend di projeya 'Hejmara Min' de hatin tomarkirin



Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi daxuyaniyekê amarên dawî yê tomarkirina projeya "Hejmara Min" a karmendên Hikûmeta Herêma Kurdistanê eşkere kir. Navenda Medya û Zanyariyan a

Hikûmeta Herêma Kurdistanê îro 5ê Kanûnê ragihand, heta niha nêzikî 175 hezar karmendên Herêma Kurdistanê di projeya "Hejmara Min" de hatine tomarkirin û proseya tomarkirina karmendan berdewam dike.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê, di çarçoveya dijitalkirina xizmetan de, projeya "Hejmara Min" ji bo karmendên sektora taybet û giştî, xanenişînan û hêzên ewlehiyê daye destpêkirin.

Bi vê projeyê re, karmendên tomarkirî dikarin bi awayekî parastî û şefaf, bi rêya elektronî mûçeyên xwe ji ATMyan wergirin û ji bo vê jî zêdetirî hezar bingeh li tevaya Herêma Kurdistanê wê tene danî.

Mesrûr Barzanî pîrozbahî li welatê Îmaratê kir

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ku ji bo beşdariya li Lûtkeya Cîhanî ya Keşûhewayê COP28 li Dubey ye, bi Cîgirê



Serokwezîr û Wezîrê Navxwe yê Îmaratê Şêx Seyf Bin Zayid Al Nehyan re civiya.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî, bi sedema hatina Roja Niştimanî ya Îmaratê jî pîrozbahî li serkirdayetî û gelê Îmaratê kir û spasiya Îmaratê kir, ji bo piştewaniya berdewam a ji Herêma Kurdistanê re.

Cîgirê Serokwezîr û Wezîrê Navxwe yê Îmaratê bal kişand ser pêwendiya taybet a di navbera Herêma Kurdistanê û Îmaratê de û girîngiya pêgeha Herêma Kurdistanê wek nimûneyeke geş li Iraq û herêmê anî ziman.

Di hevdîtîna de, pêşatên dawî yê li Iraqê û pêşxistina pêwendiyên di navbera Herêma Kurdistanê û Îmaratê di warên cuda de hatin gotûbêj kirin.

Çelik: Demsala îstismarkirina dengdêrên Kurd ji aliyê CHPê ve destpê kiriye!

Alîkarê Serokê Giştî yê AK Partiyê û Berdevkê Partiyê Omer Çelîk piştî Civîna Lijneya Rêveberiya Navendî ya li navendê der barê rojevê da daxuyanî da.



Çelîk bersiva pirseke derbarê gotinên Serokê Giştî yê CHP'ê OZgur Ozel da. Serokê CHPê di gotareka xwe de di derbarê kurdan de axivî û gotibû ku; Li Tirkiyeyê her kes wekhev e, lê Kurd kêma wekhev in' û divê kurd jî şeredarên xwe hilbijêrin" Çelik bersiva xwe de got: "Ev tê wê wateyê ku dema hilbijartinê ya CHP'ê ya îstismarkirina hilbijêrên Kurd dest pê kiriye."

Çelik berdewama axavtina xwe de got: "Li ser van mijaran me têkoşîn da ku newekheviya di navbera hemû pêkhatayên Tirkiyeyê de ji holê rabe. Em ê rojekê ji we re bibêjin, em baş dizanin ku serokê me û hevalên me yê di vê têkoşînê de bi çî tehdîdan re rû bi rû mane, bi çî rîsk û xetereyan re rû bi rû mane, em ji kîjan cînetên siyasî rizgar bûn û ev têkoşîn bi ser ket, raya giştî, her kes baş dizane. . Îro dema hilbijartinê herêmî nêzik dibin, CHPê bi gotina Serokê xwe yê nû, ragihand ku demsala îstismarkirina dengdêrên kurd vekiriye. Ji bilî wê ti qîmeta wê peyvê nîne."

Çelik vekirî da xuyakirin ku, ji bo pîrsa Kurd dema hinek gav avêtin rasta astengên mezin hatine heta radeya ku hatine tehdît kirin jî.

Yerlikaya: "Di 6 mehên dawî de 82 êrîşên bombeyî hatin astengkirin"



Wezîrê Karên Navxweyî yê Tirkiyê Yerlikaya di derbarê operasyonên ku di 6 mehên wezîfeya wî de hatine kirin, agahî da. Wezîrê Karên Navxweyî Alî Yerlikaya, ji roja ku dest bi wezîfeyê kiriye û heta niha li ser hesabê xwe yê medya civakî operasyonên li ser mijarên wek têkoşîna dijî terorê, tiryak, çete û sûcên sîber agahdariyan parve dike.

Yerlikaya, ku her roj li ser hesabê xwe yê medya civakî X di derbarê operasyonên ku tên kirin agahiyan dide, di civîna çapemenî ya li Enqereyê 6 mehên dawî yê peywira xwe nirxand. Yerlikaya got: "Di operasyonên dij-terorê yê 1ê Hezîranê û vir ve 502 PKK/KCK, 98 DEAŞ û 9 jî endamên rêxistina terorê ya çepgir bi tevahî 609 terorîst hatin berterefkirin".

Yerlikaya diyar kir ku li dijî PKK/KCK 13 hezar û 641 operasyon hatine kirin, ji van 1973 li bajarên û 11 hezar û 668 jî li bejahiyê hatine kirin û wiha dewam kir: "Di operasyonên li dijî rêxistina terorê ya cudaxwaz de 53 kujtî, 363 sax û 4 brîndar, bi yekûnî 502 terorîst hatine berterefkirin, 82 ji wan jî teslîm bûne". Yerlikaya destnîşan kir ku di 6 mehên dawî de li dijî FETOyê 2 hezar û 839 operasyon hatine kirin, 4 hezar û 482 şikbar hatine binçavkirin, ji wan 994 kes hatine girtin, ji bo 933 kesan jî biryara kontrola edlî hatiye dayîn.

Wezîrê Karên Navxweyî her wiha diyar kir ku di çarçoveya têkoşîna dijî terorê de di 6 mehên da 100 êrîşên terorê hatine astengkirin û got: "82 ji van êrîşên bombeyî û 18 jî terorîstên ku diçûn çalakiyê" bûn.

Di derbarê koçberên li Tirkiyê de jî Yerlikaya got ku "li welatê me 4 milyon û 613 hezar û 984 koçberên bi rêk û pêk hene".

Namzedê PDKê: 'PDK bi plan vegeriya Kerkûkê, wê deshilata xweferzkirî nemîne'

Namzedê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) yê ji bo Encûmena Parêzgeha Kerkûkê Mihemed Xurşîd got ku PDK bi plan piştî şeş salan vegeriya Kerkûkê û bi dirûşmeya pêkvejiyanê ala xwe bilind kiriye.

Namzedê PDKê Mihemed Xurşîd ji K24ê re ragihandiye: "Yek ji xalên kabîneya niha ya Iraqê ew bû ku divê rewşa Kerkûkê asayî bibe. PDK piştî şeş salan bi rûmet vegeriya Kerkûkê, ala xwe bilind kir û baregeha xwe bi durûşmeya pêkvejiyanê ji bo xizmetkirina Kerkûkê û rûniştvanên bajêr vekir."

Mihemed Xurşîd got: "PDK bi plan vegeriya Kerkûkê. Em dixwazin gelê me bi awayekî demokratîk biçin ser sindoqan, da ku rewşa niha ya Kerkûkê biguhere."

Namzedê PDKê destnîşan kir: "Dema Encûmena Parêzgeha



Kerkûkê hebe û namzedên PDK jî bibin xwediyê para şêrê, ev desthilata xweferzkirî dê bidawî dibe û parêzgarekî rewa ji bo Kerkûkê dê were hilbijartin. Hemû neheqiyên ku bi riya Encûmena Parêzgehê li xelkê Kerkûkê hatine kirin, dê

nemînin." Herwiha Mihemed Xurşîd daye zanîn: "Xelk ji bo vegera PDKê bo Kerkûkê dilxweş e. Dema PDK li Kerkûkê amade be, em piştrast in ku xelkê Kerkûkê dê biçin ser sindoqan ji ber ku dizanin ku PDK dikare guhertinan bike."

Kurd û dîplomasi



Kurd milletekî mêr mêrxas, têkoşer û şerker e. Kurdan tucarî di şer de winda nekiriye. Tiştê ku pişt Kurdan şikandiye siyaset e, dîplomasi ye, têkilî û dosyaniyên navnetewî ne. Yanî, Kurdan ne di şer de, lê li ser maseyê winda kiriye. Dîplomasi tê wateya ragihandina siyasî û yasayî ya navnetewî.

Dîplomasi ji bo çareserkirin û naskirina pirsgerêkan, ji bo qezenckirina dost û hevalbendan tê kirin. Dîplomasi herweha hem di qada herêmî û hem jî di qada navnetewî de çêkirina lobiyê ye. Dîplomat jî bi rêya nûnertiyên biyanî û nûnertiyên dîplomatîk kar dikin û ji millet û welatê xwe re, ji armanc û destkeftiyên xwe re dost û palpiştan peyda dikin.

Dîplomasi amûra sereke ya siyaseta derve û rêveberiya cihanî ye. Peyman, tifaq û têkiliyên navnetewî gelek caran encama danûstandin û pêvajoyên dîplomatîk in. Dîplomat jî bi şîretên karbidestên hikûmetê dikarin alîkarîya avakirina dewleteka xwe bikin.

Dîplomasi di siyaseta derve de tê wateya çareseriya pirsgerêkan a bi rêbazên aştiyane û danûstandinan. Dîplomat jî ew kes e ku peywendiyên navnetewî pêk tîne û vî karî ji bo xizmeta millet û welatê xwe wek pîşe dîke.

Dîroka dîplomasiyê pir kevn e û xwe digihîne dema Hîtît an. Ji dema Hîtît an û heta îro nakokî û şer û pevçûn, bi rêya danûstendinê, ango bi rêya dîplomasiya herêmî û navnetewî hatine çareserkirin. Îro jî wilo ye, sibê jî wê wilo be.

Bêyî dîplomasi û dan û stendina navnetewî, bêyî hebûna dost û dilxwazan çareseriya nakokî û pirsgerêkan zehmet e. Ji ber vê yekê, nemir Serok Mistefa Barzanî digot „Dostên xwe zêde bikin û dijminên xwe kêmbikin“. Û xuyaye PDK û Barzanîyan ev yek ji bîr nekirine û di zanebûna girîngiya dîplomasiyê û zêdekirina dostan de ne.

Komcivîna Cihanî ya Keşûhewayê (COP28) li Îmarata Erebi hat lidarxistin



û evê komcivîne carek din mecala dîplomasi û zêdekirina dostan da Kurdan. Beşdarbûna Serokê Kurdistanê birêz Nêçîrvan Barzanî û Serokwezîr birêz Mesrûr Barzanî û bi dilgermî pêşwazîkirina wan a ji alî serokên

gelek dewletan ve, hem nîşana xurtbûna dîplomasiya Barzanîyan û hem jî nîşana naskirin û nasandina doza Kurd û Kurdistanê ye. Ev yek hem ji bo îro û hem jî ji bo pêşeroj û çarenûsa Kurd û Kurdistanê gavên girîng û pîroz in.

Felah Hesên bi nûneratiya Serok Barzanî beşdarî Konferansa Washingtonê ya Partiyên Demokrat ên Cîhanê dibe

Serokê Kongreya Ciwanên Kurdistanê (KYC) Felah Hesên li ser navê Serok Barzanî, beşdarî Korbenda Washingtonê ya Partiyên Demokrat ên Cîhanê dibe û peyama Serok Barzanî jî di konferansê de pêşkêş dibe.



Korbenda Washingtonê ya Partiyên Demokrat ên Cîhanê, salane ji 4 heta 6ê Mijdarê li Washingtonê tê lidarxistin û bi dehan serkirde, wezîr, kongresman û dîplomatên demokrat ji seranserê cîhanê tê de beşdar dibin.

Di vê korbendê de, Felah Hesên çendîn dîdarên girîng bi nûneratiya Serok Mesûd Barzanî pêk tîne, ji bilî pêşkêşkirina peyama Serok Barzanî ji amadebûyan re.

Tirkîyeyê Bamernê bombebaran kir welatîyekî şehîd bû

Balafirên şerî yê Tirkîyeyê cihêkî nêzî navenda Nahyeya Bamernê bombebaran kir, welatîyekî şehîd kir û sê welatîyên din jî birîndar kirin. Hatiye ragehandin ku sibeha



îro di 5ê Berfembar a 2023an de, balafirên şerî yê Tirkîyeyê cihêkî nêzî navenda Nahyeya Bamernê bombebaran kir, welatîyekî şehîd kir û sê welatîyên din jî birîndar kirin. Birîndarên biberketiyên bomberanê ji bo nexweşxaneyê hawarhatinê ya Dihokê hatine veguhastin. Ew bombebaran nêzî seet 7:00 ê sibeha îro hatiye kirin û ev cara yekê ye ew cihê tê bombebarankirin.

Mamê Metîn Sedîq ku yek ji birîndarên îro ye Bazîd Cemîl, ragehand ku "Saxlemiya Metînê baş e lê me ew nedîtiye ji ber ku rêyê nadin me ku em biçin jor".

Nahyeya Bamernê girêdayî qezaya Amêdiyê û parêzgeha Dihokê ye. Ew cihê ku hatiye bombebarankirin, wekî ku mamê Metînê behs kir, "Tenê 200 metran ji navenda nahyeyê Bamernê dûr e. Par jî nêzî vî cihê hat bombebarankirin lê par çî kesekî şehîd nebû. Vê carê me şehîdek û sê birîndar hene". Bazîd Cemîl herwesa amaje da, "Metîn û çend hevvalên wî her roj bi belênderekî re li wî cihê hatiye bombebarankirin karê çandinê dikin". Herwesa got, "Ew bombebarankirin bi behaneyê hebûna çekdarên PKKyê hatiye kirin, em daxwazê ji hemî aliyên dikin ku arêşeya navbera Tirkîyê û PKKyê çare bikin, ji bo ku çî kesên din nebin qurbanîyên hevrikiyên wan.

Mijara Girîng Neçîrvan û Mesrûr Barzanî li Îmaratê çî qise kirin?



Îbrahîm GUÇLU

Komcivîna Cîhanî ya Keşûheweyê (COP28) li Îmarata Erebi hat lidarxistin û Serokê Herêma Kurdistanê Neçîrvan Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî jî beşdarî konferansê bûn. Ew bi dilgermiyekê ji aliye serok û serokwezîrên gelek dewletan ve hatin pêşwazî kirin. Ew pêşwaziya bi dilgermî hem nişana xurtbûna dîplomasiya Barzaniyan û hem jî qiymeta statuya Herêma Federe ya Kurdistanê wek dewleteke serbixwe ye. Ev pêşwaziya herdu serokan ji aliye gelek serok û serokwezîran ve, di heman dem de ji bo nasandina Doza Kurd û Kurdistanê û ji bo pêşeroja çarenivîsiya Kurd û Kurdistanê jî gelek girîng e.

Şik tune ye ku ji bona Doza Kurd û Kurdistanê, ji bo Tevgera Neteweyî ya Kurdistanê li hemû parçeyên Kurdistanê, dîplomasiya û danûstandinên navneteweyî jî gelek girîng in. Loma jî serokê efsanewî yê neteweyî Mele Mistefa Barzanî gotiye, "divê Kurd û Tevgera Kurd ya neteweyî, di seheyê navneteweyî de dostên xwe zêde bikin û dijminên xwe kêmbikin".

PDK û Barzaniyan ev wasiyeta Serokê Mezin bîra nekirin, her deme qiymeta dan dîplomasiyê, di seheyê navneteweyî de dostên xwe xwestin zêde bikin. Serok Mesûd Barzanî her dem ev wasiyeta gelek bi xurtî û bi exlekeke bilind pêk anî. Loma jî di seheyê navneteweyî de bû xwediyê qedir qiymeteke bilind. Serokê û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Barzaniyan ciwan jî



qiymeta didin dîplomasiyê û danûstandinên navneteweyî.

Baş tê zanîn ku dîplomasiya aktora sereke ya siyaseta derve û rêberiya cîhanî ye.

"Peyman, tifaq û tîkiliyên navnetewî gelek caran encama danûstandin û pêvajoyên dîplomatiyê in. Dîplomatiya jî bi şîretên karbidestên hikûmetê dikarin alîkariya avakirina dewleteka xwe bikin.

"Dîplomasiya di siyaseta derve de tê wateya çareseriyê pirsgrêkan a bi rêbazên aştiyane û danûstandin. Dîplomatiya jî ew kes e ku peywendiyên navnetewî pêk tîne û vî karî ji bo xizmeta millet û welatê xwe wek pîşe dibe.

"Dîroka dîplomasiyê pir kevn e û xwe digihîne dema Hîttî an. Ji dema Hîttî an û heta îro nakokî û şer û pevçûn, bi rêya danûstandinê, ango bi rêya dîplomasiya herêmî û navnetewî hatine çareserkirin. Îro jî wilo ye, sibê jî wê wilo be." (Rojevakurd).

Di encamê de divê bê zanîn ku dewlet û neteweyî, ji bona berejewendiyê xwe dîplomasiyê pêk tînin. Her dewletek û neteweyek ji bona berjewendiyên wan pêk bînin dîplomasiya û danûstandinên navneteweyî dimeşînin.

Yekîtiya Sovyetan ji bona berjewendiyê xwe jî avakirina Dewleta Kurdistanê ya Mehabadê re bû alîkar. Dema berjewendiyê wan ya dewletî û dewletbûnê jî, ji bona ku Dewleta Kurdistanê bê xirakirin û serokê Kurdistanê bîndam kirin, îzin da û an jî çavên xwe ji Dewleta Hov ya Îranê re girt.

Amerîkayê ji bo berjewendiyê xwe dewletê, ji bona ku Otonomiya Kurdistanê xira bibe (1975) ji Îranê re bû alîkar û hevkarîya xwe ya Kurdistanê qetand û bû sedem ku Peymana Cezayîrê bê li dar xistin û di encamê de Otonomiya Kurdistanê tîk biçe. Dîsa Amerîka û Yekîtiya Ewropayê ji bo berjewendiyên xwe, ji bona ku encama Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê yanî Dewleta Kurdistanê ava bibe, alîkarî nekirin. Bûn sedem ku Kerkuk û gelek herêmên din ji aliye Hikûmeta Navendî ve bîndam kirin.

Neçîrvan Barzanî û Mesrûr Barzanî jî, li Îmaratê di pêwendiyên xwe yê dîplomatiyê de bê şik berjewendiyê Herêma Federe ya Kurdistanê û Doza Kurd-Kurdistanê parastine.

Lê di vê qonaxê de mijara ku bê qise kirin, pêkanîna encama refêrandûma serxwebûna Kurdistanê ye. Lewra di vê qonaxê de û bi taybetî jî di Konferansa Îmaratê de mijara dewletbûna Filîstîniyan hate qise kirin. Bi taybetî jî dewletên Kurdistanê îşgal û îlxak kirine, qala dewletbûna Filîstînê kirin. Em ne li dijî dewletbûna Filîstînê nî. Lê divê Herêma Federe ya Kurdistanê jî dewletbûna xwe bîne ser zimên. Lewra bi rêyê gelek demokratîk û aştiyane bi refêrandûmê, Kurdistanîyan, biryara dewleta xwe dan.

Gelo Serok û Serokwezîrê Herêma Federe ya Kurdistanê li konferansa Îmaratê ev mijara qise kirin?

Diyarbakîr, 02. 12. 2023

Baregeheke Hevpeymanîya Navdewletî li Heskê hat armanckirin

Baregeha Hêzên Hevpeymanîya Navdewletî ya li dijî DAIŞê li Rimêlana Rojavayê Kurdistanê bi du droonan hat armanckirin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan (SOHR) belav kir, rêxistina "Berxwedana Îslamî li Iraqê" îro bi mûşekan êrîşî baregeha Xirbit El-Cîr a Hevpeymanîya Navdewletî li Rimêlanê li parêzgeha Heskê kirin. Diyarbakîr jî, ew êrîş ji Iraqê ve ji aliye koma bi navê "Berxwedana Îslamî" hatiye kirin û heta niha ti zanyarî li ser ziyarên wê êrîşê tune ne.

Di çend rojên borî de, piştî şerê di navbera Îsraîl û Hamasê de, êrîşên li ser baregehên leşkerî yê Amerîkayê li Sûriyê û Iraqê zêde bûne.

Li gorî Rewangehê, ji 19ê Cotmeha borî ve, 47 caran baregehên Hevpeymanîya Navdewletî li



Rojavayê Kurdistanê û Sûriyeyê hatine armanckirin.

Li hember vê yekê, Amerîka çendîn caran milîsên alîgirên Îranê li Iraq û Sûriyeyê bombebaran kirine. Wezareta Derve ya Amerîkayê aşkere kiribû, wan di bersiva êrîşan de, 4 caran ew komên ku êrîş pêk anîne, bombebaran kirin.

Gotinek di 45 Saliya Koçkirina Mîr Dr. Kamîran Bedirxan de

"Xort bin, pîr bin, heçî nezan in divê, dest bi xwendin û nivîsandina zimanê xwe bikin; û ne bêjin qiweta min na gihe vî îşî; ez heq ji vî îşî dernayênim. Tiştê ko zaroyên heft, heşt salî dikarin, xort û

Ewropa, nûneritiya Şoreşa Başûrê Kurdistanê kir.. Di lihevhatina 11ê adara 1970î de, Barzaniyê nemir jê xwest ku bibe Cîgerê Serok Komara Îraqê, lê ew razî nebû, bi tenê xwest ku bibe

zarono werin emê bi hev re sund bixwin û heta ko derdê nezaniyê koka vî giyaşê jehrîn û jehirdar ji erdê xwe hilkişînin, dest ji xebatê, ji teşwîq û irşadê ber ne din.."

Mîr Dr. Kamîran Bedirxan, Rojnameya (Stêr), hej/ 2, sal 1944.

Û bi weşana Rojnameya (Roj Nû) re, Seydayê Cegerxwîn bi van gotinan ew pîroz kiriye: "Mîrê mezinê mêran, xortê xurt zanayê Kurd Dr. Kamîran Alî Bedir-Xan! Hevalo! Di van rojan de Roja Nû, weke rojê geş, tav û tîrêjên wê dane dîwarê me jî yê xortan. Çirûsk û ronahiya wê, leylana paşketin û bêhêviyê, ji ser dilê ciwanên kurdan hildane. Kela jiyana welêt ji kela mirinê gîhande delavê serbestiyê. Bûka xweşxwan û nivîsaran xemiland bi qumaşê evîn û zanistiyê. Pira nejadperestî bi topên baweriyê daweziran û di tangê dilxwîşiyê de afirand. Ji wî rîya wa a dîr bi hezaran kîlometir şose kir û derê bajarê armanca me, li me vekir. Xwedê te û roja te bi rûkî spî û jineke dirêj ji kurdan re bihêle. Ji ber xortan ve, roja te pîroz be".

Cegerxwîn, Roja Nû, hej: 10, 5ê tîrmehê 1943.

Wek ku min got Mîr Dr. Kamîran Bedirxan di roja 04.12.1978an de li Parîsê koça dawî kiriye, belê wî berî mirina xwe, termê xwe kiribû diyarî ji fakulteyên bijîşkî re li Parîsê, anku ew bê gore! Rehma Xwedê li cane wî û cane tev neferên malbata wî be.

Roja îro, yên ku bixwazî fêrî xwendin û nivîsandina Zimanê Kurdî bibin, pêwîste berî her tiştî nivîsandinên Mîr Celadet û Dr. Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Osman Serbrî, Cegerxwîn û yên mayî ku nivîsên wan di kovara (Hawar, Ronahî, Stêr û Roja Nû) hatine weşandin, bixwînin.. Di rêka van kovar û rojnameyan de, mirov serwestî destpêka nivîsên ku bi kurdiya latînî hatine nivîsandin dibe.. Di baweriyê min de miletê ku lehengên xwe jibîr bike, wan di ser guhên xwe re bavêje, nikare tiştê çak ji miletê xwe re pêşkêş bike..!

Konê Reş



mirovên sere jî dikarin. Gerandina îş û karên me, heke ji destê me na ye; îş û karên me naçin serî, dawiya me di destê xelkê de perîşan bûne.. Di Bêrûtê de dibistaneke kurdî heye; panzde mirov ketine vê medresê; di nav wan de xortên bîst salî û peyayên çel, çel û pênc salî hebûn. Ev di nav sê mehan de hînfî xwendin û nivîsandinê bûn û îro Hawar û Ronahiyê dixwînin. Xebat şêre, te dest avêtê dibe rovî".

Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan, kovara (Roj Nû), hej (11) sal 1943

Werin em 45 Saliya Koçkirina lehengê Kurdistanê Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan bibîr bînin..! Yê ku tev jiyana xwe ji Kurd û Kurdistanê re terxan û xerc kir; bi serketinên welatîyên xwe re geş dibû, bi têkçûnên wan re, dilê wî dihat givaştin û xemgîn dibû..

Wî, ji Stenbolê destpê kir.. Bi Mêcer Nowêl yê Ingilîzî re li Kurdstana bakur geriya.. Navê wî di lîsteya 150 kesî de, bidarvekirinê hat derxistin.. Digel bav û biran xwe li mîrekên Berazan yên (Meqtelê/ Kobanî), girtin.. Li Almaniya xwendina xwe bir serî.. Li Beyrûtê du rojname bi navê: (Roj Nû) û (Stêr), bi Zimanê Kurmancî belav kirin.. Li Parîsê, di Zanîngeha Sorbonê de Zimanê Kurdî parast û pêşxist.. Li

mamosteyê Zimanê Kurdî di dibistanek çiyayê Şingalê de..

Dawî, di roja 04.12.1978an de, li Parîsê, di koçberiyê de, wek piraniya ap, bira û pismamên xwe ku di sirgûniyê de koça dawî kirine, ew jî çû ber dilovaniya Xwedê. Erê werin, werin piştî 45 salan em vî lehengê xwe bibîr bînin..

Xwendevano! Ku ez û te yekî wek Mîr Dr. Kamîran Bedirxan bi bîr neyin, ma wê kî wî bibîr bîne..?! Evê ku li dor Zimanê Kurdî, wiha ji me re gotiye:

"Her wekî em jê bê behr in, divê hemî xwendevanên me, xwe mamoste, û dursa xelkê bibêjin, kurd, gundî pale û xebatkarên me ji xwendin û nivîsandinê, ji zanîne gelekî hez dikin û minêkarî ilm û hinerê ne, lê piraniya wan bawer dikin ko û nivîsandin tiştêkî gelek zehmet e, bê ko mirov bi salan ve bikeve xwendagehekê, nikare hînfî xwendin û nivîsandinê bibe. Divê em nav di xelkê xwe bidin û bi şewq û xweşî bibin mamostayê wan. Divê em wan qanî bikin ko, em kurdên xwenda ji wan ne aqiltir in, ew jî, em jî kurd in zaroyên welatekî ne, hêjabûna me - heke heye - ji xwendin û zanîne tê, ko wan jî xwend û zehf û çak xwend, wê bibin mîna me... Birano, pismamno,

HEDEP: Em ji bo hîlbijartinên heremî amade ne

Berdeвка HEDEPê radigihîne, ew xwe amade dikin li her cihê Tirkîyeyê namzedên şaredariyan destnîşan bikin.



Civata Rêveber a Navendî ya HEDEPê ev du roj in li ser hejmarek pirs û mijarên hestiyar ên wekî nexşerêya HEDEPê ya di hîlbijartinên şaredariyan de û redkirina navê HEDEPê ji aliyê Dadgeha Bilind ve dicive.

Berdeвка HEDEPê Ayşegül Dogan ragihand, hîlbijartina şaredariyan bo wan pêvajoyeke nû ye û ew dixwazî di vî pêvajoya nû de destkeftiyên xwe li hemû bajar û bajarokên Tirkîyeyê mezintir bikin.

Herwiha got: "Li parêzgehên Rojava jî komîsyonên me hatin avakirin. Me dest bi wergirtina serlêdanên namzetên namzetan kir. Bi gotineke din amadekariyên me tamam bûne ku em bi namzedên xwe beşdarî hîlbijartinên heremî li seranserê Tirkîyê bibin."

Amerîka êriş li Heşda Şabî kir û Iraq mewziyên DAÎŞê bombe kir

Amerîka konvoya Heşda Şabî ku amadekariya êrişkirina bergeha Amerîkayê dikir bomberbaran kir. Hatiye ragihandin ku Amerîka li Dubîza navçeya Kekukê wê êrişê kiriye û di encamê de hemû 5 milîsên Heşda Şabî hatine kuştin.



Ji aliyê din de, Serbazîya Iraqê jî mewziyên rêxistina terorî DAÎŞê li Kekukê bomberbaran kir.

Li gor nûçeya Reutersê ku wek çavkanî hêzên ewlehiya Iraqê nîşan dide, li bakûrê Kerkukê konvoya milîsê Heşda Şabî yê ku bi ser Îranê ve ne, ku amadekariya dikrin fuze biavêjin baregehên Amerîkayê ji aliyê balafirên Amerîkî ve hatine bombebaran kirin. Qaymeqamê Dûbîzê ragihand ku Rêvebiriya Tenduristî ya Dûbrîzê tîma hewarçûnê şiyandiyê ciyê buyerê, lê termên cangoriyên ji ciyê buyerê hatine rakirin.

Ji aliyê din de Amerîkayê di 3ê Berfembarê de, ragihandibû ku di demjimêrên sibehî de, li Rûmelan a li Rojavayê Kurdistanê êriş li wan hatiye kirin û tu ziyaneke canî û malî çenebuye.

Rêxistina Berxwedana Îslamî êrişê piştrast kir ku konvoya wan ji aliyê Amerîkayê ve rastî êrişê hatiye. Di daxuyaniyê de hatiye ragihandin ku 5 endamên wan canê xwe jidest daye.

Milîşeyên Şîa lihev civiyane û di daxuyaniya wan a hevpar de, hatiye gotin: "Ji bo piştgiriya Filîstinê û tolhildana şehîdan dê hefteya pêşiya me, emê li dijî minên xwe êrişên nû bikin."

Ji aliyê din de serbazîya Iraqê jî li Dakûka ku li navbera Pirdê û Kekukê ye, bi operasyoneke hewayî mewziyên DAÎŞê bombe kir.

Yavuzyılmaz: Em hemû dizanin ku di serdema AKP de neheqî li Kurdan hatiye kirin

Deniz Yavuzyılmaz ê CHPî, di Civîna Koma CHP de bersiva Erdogan da û got: "Li gor we her kes terorîst e, herkes xerabe ye, herkes ketî ye!"

Endamê Meclîsa Giştî yê CHPê Deniz Yavuzyılmaz, piştî Civîna Lijneya Rêveberîya Navendî, di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê de bersiv da gotinên ku Serokkomar Recep Tayyîp Erdogan di civîna koma partiya xwe de gotibûn.

Erdogan di civîna koma partiya ya li Meclîsa Mezin a Tirkîyê de ji ber maçkirina destê sopranoya Kurd Pervîn Çakar Serokê CHPê Ozgur Özel kiribû hedef û gotibû: "Wan ev yek wek jêhatîbûnê dît. Li operayê guhdarî bikin, taştê bixwin û bi kesên ku afgirê rêxistina cudaxwaz in tifaqa hîlbijartinê ava bikin. Niha jî ji ber ku destên hev maç kirine ew xwe bi rûmet dibînin".

Deniz Yavuzyılmaz, di bersiva xwe de got: "Yê ku herî zêde mazûrvaniya Pervîn Çakar kiriye û aniye ser ekranên xwe yê TRT hûn in. TRT arşivên xwe jêbibe jî ev rastî



winda nabe. Ez bang li birêz Erdogan dikim: Hûn dibînin ku serokê me birêz Ozgur Özel destê jinek operayê maç dike, lê hûn nikarin bibînin ku wî destê şêxekî maç kiriye! Li gor we her kes terorîst e, her kes rizyayî ye, herkes şerpeze ye! Ji ber ku hûn me li kêleka terorîstan nabînin, hûn çareseriyê di tohmetên bêbingeh de dibînin. Em fêm dikin, hûn niha jî bi rewşek pêkenok me bi rêxistinên terorê yê cudaxwaz tînin ba hev".

Yavuzyılmaz, anî zimên ku di serdema AKP de Kurd zêdetir rastî cudakariyê hatine û got: "Em nizanin pirsgirêka Erdogan û Bahçelî ya bi

Kurdan re çî ye. Hemû mirov wek hev in, hinek jî kême wekhev in. Binêrin, ev gotin ji berhema navdar a George Orwell a bi navê Animal Farm, ku bi ziman û çîrokek balkêş rexne li newekheviyên Yekîtîya Sovyetê yê di serdema Stalîn de dike. Em gotinên serokê xwe birêz Ozgur Özel ku dibêje, "Kurd li Tirkîyê zêdetir newekhev in. Kurd yek ji damezrînerên Komara Tirkîyê ne. Em hemû dizanin ku di serdema AKP de neheqî û cotstandard li hember birayên me yê Kurd hatine kirin, ev çend sal in êş kişandine, ev êş di serdema AKP de hîn zêdetir bûne".

LÜĞƏTLİ ƏLİFBA-ALFABÊYA BI FERHENG

Aa



av

Ev çîye? Ev **a**ve.
Bu nədir? Bu sudur.
Что это? Это вода.
What is it? It is water.




diran

Ev çîye? Ev dir**a**ne.
Bu nədir? Bu dişdir.
Что это? Это зуб.
What is it? It is a tooth.



agir

Ev çîye? Ev **a**gire.
Bu nədir? Bu oddur.
Что это? Это огонь..
What is it? It is fire.



mar

Ev çîye? Ev **m**are.
Bu nədir? Bu ilandır.
Что это? Это змея..
What is it? It is a snake.

Bb



bizin

Ev çîye? Ev **b**izine.
Bu nədir? Bu keçidir.
Что это? Это коза.
What is it? It is goat.



balon

Ev çîye? Ev **b**alone.
Bu nədir? Bu şardır.
Что это? Это шар.
What is it? It is a balon.



bacan

Ev çîye? Ev **b**acane.
Bu nədir? Bu pomidorur.
Что это? Это помидор.
What is it? It is a tomato.



otomobil

Ev çîye? Ev otomob**i**le.
Bu nədir? Bu maşındır.
Что это? Это машина.
What is it? It is a car.

Cc



taç

Ev çîye? Ev ta**ç**e.
Bu nədir? Bu tacdır.
Что это? Это корона.
What is it? It is a crown.



canî

Ev çîye? Ev **C**anîe.
Bu nədir? Bu daydır.
Что это? Это жеребенок.
What is it? It is a horse.



cücük

Ev çîye# Ev **C**ücike.
Bu nədir? Bu cücüdür.
Что это? Это цыпленок.
